

## JI Ê MÊRTIR RE (\*)

Di bajarekî welatê Êris de rojnamevanên biyanî fabrîkeke çekan ziyaret dikir. Yekî ji wan di heqê wê ziyaretê de bendek nivîsandiye û tê de çîroka jêrîn gotiye:

Gava ez gihastibûm fabrîkê wextê xebatê tamam bûbû û Emele di hewşê re derbas dibûn û diçûn avahiya pêşmiqabil, xwarina Emelan tê de bû. Emele di ber me re wek çemekî boş diherikîn. Bê hemtê min çavên min bi xort û keçikekê ketin. Keçik, keçikeke delal, bi difina xwe a ber bi jor tîpê jinên rûsî dinimand. Hevalê wê xortekî esmer bû û cilên deryavanan lê bûn. Xort lingê xwe ê çepê bi awakî neadetî datanî erdê. Qey lingê wî bê wî pêlê dikir; hêj bêtir wek darekî hişk diket erdê. Mihendisê ku rêberiya me dikir, wî jî li wan nihêrî û gote me: Reben dikule, lê çi qehreman e.



Mihendis hinek sekinî û paşê got: Vî xortî û vê keçikê çîrokeke ecêb heye. Navê keçikê Klêva ye. Berî deh mehan keçik di xestexaneyên eskerî de dixebitî. Ne ku li nexweşan difedkirî; lê di defterxana xestexanê de bi nivîsanê mijûl dibû. Herwekî hûn dizanin jinên me ji eskerên me yên ku di eniya şer de ne, diyariyan dişînin. Îcar Klêvayê jî rojekê rabû pakêteke diyariyê çêkir û ew ji eskerên eniyê re şand. Dîsan bûye adet, jinika ku diyariyê dişîne resmekî xwe di pakêtê dîke û li rex resmê xwe nav û adrêsa xwe û ji eskerê nenas re çend pirsên şîrîn jî dinivîsîne. Klêvayê jî li gora adetê resmê xwe di pakêtê kir û li rex nivîsand: "Ji ê mêtir re" yanî ji wî eskerî re ku di şeran

de ji hemiyar mêtir derketiye. Diyariya Klêvayê digel diyarîne din gihaste eniyê û di dema belavbûna diyariyan de ya Klêvayê bû nesîbê deryavaneke bi navê Sarc.

Sarc pakêt vekir, li resmê keçikê temaşe kir û lê heşmetkar ma. Lê gava tiştê li rex nivîsandî xwend dudilî pê re çêbû. Gelo, ew di nav hevalan de ji hemiyar mêtir bû. Sarc dida eqilê xwe û qaîliya xwe pê ne tanî. Dawiyê resm û pakêt girtin; çû cem zabitê xwe û got ê:

-Ev pakêt dane min; lê ez bawer nakim ku di nav hevalan de ê mêtir ez im; Ji lewre...

Zabit resim girt, lê temaşe kir; ew şanî eskerê xwe da û ji wan pirsî:

-Çawan, we ev keçik eciband?. Deryavanan yekdeng û yekawaz got: Gelek, gelek...

Zabit got: Xwedîya wê dibêje ev resim ji ê mêtir re ye; ê mêtir kî ye?

Zabit dîsan got: Lê di nav we de ê mêtir kî ye?. Bila ew gavekê ber min ve were.

Li ber vê pirsîyayê deryavanan xwe ker kir. Hemî mêr, hem mêrine qenc bûn. Lê dîsan hemî wek her mêre qenc nefspiçûk man.

Zabit bihinekê sekinî û dîsan got: Emê îro dirêjî dijmin bikin, di vê êrîşê de mêtirê we ezê bi xwe bibijêrim û resmê delalê bidime wî. Zabit resim kire bêrika xwe û piştî saetekê deryavanan berda tabyeke dijmin. Sarc di nava sefên dijmin re xwe gihande betariyên neyar bi destbombeyên xwe bera topçiyar da û ew revandin. Hevalên wî gihane ser û betarî zemt kirin. Femandariyê bi nîşanekê Sarc mikafat kir û zabitê wî resim dayê. Sarc resmê delalê kire kûrika xwe a çepê û ew li dilê xwe şidand. Sibetirê tabûra Sarc dîsan rabû êrîşê. Sarc vê carê hêj bêtir mêranî şanî da. Lê piştî êrîşê, darûbestekê ew vegehande qerargehê. Sarc birîndar bûbû. Birîna wî xedar bû. Ew guhastin xestexaneke ji eniyê dîr. Xestexana ku Klêva tê de dixebitî.

**D.R (10)**